## DĐ MALA WEDE LĐ WE LÊXĐSTĐN DĐBÊ? HĐNGÊ HÛN DĐKARÎN BĐ GEL ZAROKÊN XWE DĐ MALA JĐNANDE BÊN STARKĐRĐN.

Malên jinan çine?
Malên jinan bi teybetî cîhê starî û cîhê rewîya bi ewlehîne û navnîşanan wan di pirtûkên navnîşanande navê peydakirin. Hemû jinên kû bi laş, bi cînselî anjî bi nefsîn tên tedakirin, dikarin ger bi zarokên xwe anjî pê zarokên xwe li wêderê ewlekârîyê û âlîkârîyê bistînin, ev jî bê xweserîya kû ew ji kîderê tên, xwedîyê kijan mafên rûniştinêne û gelo aborîya xwe bi serê xwe pêk tinin. Din rewşên tengahîyênde derîyên mala jinan şev jî vekirîye.

Jîyana di malek yan jinande çawane?
Ev mal her çûkas ji hevdû cûdabin jî, di naverûka xwede wek hevin. Mehvanên jibo parezbûnê tên vê derê, jibo heza xwe nû bikin, jibo xwe û zarokên xwe menzelik bi ewlekârîde dimînin. Lê belê dibin perçek ciwatan jin û zarokên kû eynî tişt serê wande jî derbasbûyîye. Menzelê kû miriv jibo kû tene bi serê xwe bimînin jî hene û wek din jî menzelên bi hevre tên pak kirin (melbex, menzela rûniştinê, menzela jibo leyîstûkan zarokan ûwd.) jî hene. Her pîrek li xwe û zarokên xwe bi bin berpirsarîya xwede dinêrê û gelek malên jinande kârê lênêrîna zarokan tê pêşnîyarkirin.

Kesên hatina maxdorkirin kîjan alîkârîyê distînin?
Hemû malên jinan şîretvanîya belaş û pêşnîyarên pêve girêdayî dîyardikin, jibo kû bikaârin tedayîya hatî serê wan bikârin derbasbikin û perspektîvên nû yên jîyanê pêjdebibin. Jin û zarokên kû bi revî ewlekârî di mala jinande peydakirine, jibo pirsên liser kesiptîya xweya aborîyê û ewlekârîyê û liser mafê welayetê û lêdîtina zarokan, liser cûdabûn û hevdûberdanê û pêşnîyarên terapîyê agahdarî û âlîkârîyê distînin. Pêşnîyarên bi mîraz ji zarokên di malan jinande dimînin re jî tên dîyarkirin.

Pîrek heta çûkasê dikârin bi zarokên xwere di malek yan jinande bimînin?
Bi qeydî heta girîng bê dikârin bimînin. Mayina li wêderê herdem gora dilê mirove. Liser dombûna mayînê her jin bi serê xwe bîryar didê.

Jinên hatina maxdorkirin pêwîste kû çi bi xwere bînin malek yan jinan?
Ji xeynî kincan û tiştên jibo dibistanê û leyistûkan zarokan hemû namên bi nivîs yên şexsî gelek girîngen. Eger mûmkînbê pêwîste kû mirov nasname û pasaport – yên zarok jî – destûrnama rûniştinê û kârkirinê, namên zewacê û rojbûyînê, kerta ewlekârîya nexweşîyê, dermanên pêwîst û pasên zarokan yê derzîkirinê xwere bînê wêdê.

... û eger çûyîna mala jina ne mimkîn bê?
Her çûkas pîrekên bi lêxistine tên tehdîrkirin û maxdorkirin ne xwazin parizîya malan jinan bi dest bixin, dikarin şîretên bi axaftina telefonê anjî bi şexsî, pê kû werin nasîn kirin, bistînin.

Em jibo we li vêdêne, telefonê bidin me.